




Ev hewla dirustkirina pêşnûmaya nivîsarekê ye. Dixwazî alîkarîya min bikî?
Ji kerema xwe fikr û rexneyên xwe ji min ra binivîse.



Nirxandinek li ser Kurteçîroka *Xezal* a Sîma Semend

Ayşe Irmak

Xwendekara Beşa Kurdî, Çewlîg

e-mail: irmakayse024@gmail.com

AGAH. NIVÎSARÊ

KURTE

Mêjûyê Nivîsarê:

Spartin: 29.03.2019

Spasdarî: Ömer

Delikaya, Yasemin

Aşuroğlu

Peyvên Sereke: Sîma

Semend, *Xezal*,

Lenîn, Sosyalîzm,

Komînîzm, Êrîvan

Kurteçîroka *Xezalê* di nav pirtûka *Xezal* a ku nivîskarê wî Sîma Semend e derbas dibe. Di wê berhemê da sê çîrokên Sîma Semend cih digirin: *Xezal*, *Reva Rihanê*, *Mizgîn*. Pirtûk 75 rûpel e. Kurteçîroka *Xezalê* ji rûpela 9an destpê dike û 42yan da diqede.

Serlehengên çîrokên Sîma Semendê ku mijarên wan zêdetir li ser jinan in û ji alîyekî ve zîhniyeta berê wek qelend, nexwendina jinê hikmê malbatên bavkanî ji alîyekî din ve jî sosyalîzm, xwendina jinê û li hemberî kevneşopîyên paşverû ne. Em ê di vê xebata xwe da jî li ser van mijaran ku di kurteçîroka *Xezalê* da derbas dibin rawestin.

Destpêk

Sîma Semend (1935-2009) li gundê Sengerê, bajaroka Aparanê (Ermenistan) li malbateke êzidî ji dayîk dibe. Bavê wî karmendekî partîya komînîst e. Semend piştî xwendina dibîstana gundê xwe û dibîstana gundê Elegezê derbasî Zanîngeha Êrîvanê beşa filolojîyê dibe. Piştî xwendinê di enstîtûya ziman a Akademîya Ermenistanê da çend salan dixebite. Di radyoya Êrîvanê da redaktorîya beşa edebiyatê û hunermendiyê dike. Çîrok û gotarên wê di rojnameyan da bi kurdî û ermenî tîr weşandin. Ji xêncî sê çîrokên berhema *Xezalê* da Boyîk navê du çîrokên din ji dide; “*Gundê me*”, “*Temya Esker*” û du berhevokan; “*Du şayî*” û “*Guman*”. (Boyik, 2012:348-349) Lê tu agahî destê me da tune ye.

Di nav Kafkasan da dengê radibe ev deng, dengê jina kurd Sîma Semend e. Sîma Semend di heyama xwe da yanî salên şêstî da “Edebîyat tenê karê mêran e.” Li hemberê vê nêrînê bi nasnameya xwe ya jinanî di bin desthilatdariya mêran da derdixe û di nav civakî da vê fikrê hildiweşîne. (Aydoğan,2012:330) Jin di Edebîyata Kurdan da zêde dernediketî pêş me. Zêdetir ev maf ketibû destê mêran. Jin tenê berhemên nivîskarê mêran da an bi sembola evînî an jî sembola namûs hwd. dihate dîtin. Herwiha jin di jiyana civaki da her dem rola xwe ya jinanî ve dihate durxistin. Ev mafên ku hat dayînê ve jin ji her alîyê ve (sîyasî, edebî, çandî, civakî) pêş ketin.

Em dibînin ku nivîskarên jin cara ewil di Ermenistanê da tîr dîtin. Wek Sîma Semend. Di heyama Sovyetê da jin û mêr bi hev ra Kolxozan da dixebitin û mafê xwendina wan hebûn, zimanê kurdî qedexe nebû û pirtûkên perwerdehîya kurdî ji alîyên komîsyonên legal bi piştgirîya dewletê dihate amade kirin. Ermenistanê piştgirîyeke mezin dide xebatên zimanê kurdî, tê zanin ku Kurdologên yekem di heyama Sovyetan da derdikevin holê. (Aydoğan,2012:330) Em li vir jî fêhm dikin ku bi derfet û piştgiriya Ermeniyana Kurdên me pêş dikevin.

Kurteçîroka *Xezalê* cara ewil di sala 1961ê da li Êrîvanê, bi elfabeya kirîlî dertê. Bi elfabeya latînî çapa wê ya ewil li Stockholmê (1996), çapa duyem jî Stenbolê (2015) dibe. (Keskin, 2017:163).

Di pirtûka *Xezalê* da sê heb kurteçîrok hene: *Xezal*, *Reva Rihanê* û *Mizgîn*. Kurteçîroka *mizgînê* nîvcomayî ye.

Di kurteçîroka *Xezalê* da xuya ye ku Sîma Semend di bin bandora sosyalîzmê da maye. Lewra çîrokên xwe da her dem pirsgerêkên jinê, kevneşopîyên kurdan û fikrên nû wek sosyalîzmê dide berhev. Li ser temayên azadiya jinan û dawiyê da jî bi serketina wan diqedîne. Em dibînin ku malbata *Xezalê* di bin tesîra sosyalîzmê da mane û *Xezalê* didin xwendinê û dawî da jî bi dilê wê û bê qelend didin heskirîyê wê. Lê mixabin Karê qurbana hikmê bavkaniya dibe. Fikra sosyalîzmê li ser malbata Karê tesîr nake. Li ser kevneşopîyên xwe jiyana xwe didomînin. Naxwazin Karê bixwine û li hemberê xwendina jinê derdikevin û wek rûşeyekî dibînin. Ji ber vê yekê naxwazin Karê bixwîne. Bê dilê wê û bi qelend didin mêr. Derbarê vê mijarê da Keskin wiha dibê: “*Xezal derbekî li klîşeyên civata nêrî û zayendeperest dixe, serkeftin û*

zanebûna Xezalê, nakokî û xetereya kevneşopîyên paşverû, nêzîkatîyên nêrî û bavîksalar eşkere dike; li gel vê lehenga li pêş û erênî, lehenga bi navê Karê, ne xwende, ne zana û ne pêşketî ye.; bi qasî Xezalê ne kêfxweş û bextxweş e jî. (Keskin, 2017:164)

Em di kurteçîroka *Xezalê* da jî dibînin ku pêvçûnek di nav Biro û Karê da derbas dibe. Karê her çiqas li ber bavê xwe digere û digirî jî mixabin bavê wê îqna nabe.

“*Gava wî dît ku Karê digirî damarên eniyê tevlihev bûn. Irrîneka wisan jê hat, te ê bigota ew di wê saetê da perçeperçe bû.*” (r.17) *Xezal* jî tê bi bavê karê ra diaxive lê wî biryara xwe daye ku dev ji kevneşopîyên xwe bernade. Pevçûn tenê ne di nav Biro û Karê da ye. Di nav Biro û fikra civakî da jî pevçûnek heye. Ji ber ku Biro girêdayî kevneşopîya ye li hemberê fikra civakî û fikra sosyalîzmê ye. Ji bo wî xwendina jinê bêrûmetî ye. Ji bo wê fikrê nahêle keça wî bixwîne. Ev rewşên ku wiha dertê pêş me da nîşanê me dide ku di nav rewşa siyasiya Sovyetê da jî jiyaneke rasteqîn bi zimanekî edebî li ser jiyana gelan radiwestiyan û rewşên wiha bi rêya realizma sosyalîstê va derdiketin holê.

Nivîskarên li Sovyetê bi realizma sosyalîst nivîsandine. Di salên 1930î da realizma sosyalîst li Sovyetê wekî hunera fermî ya dewletê tê qebûl kirin. Di sala 1934an da di Kongreya Yekemîn ya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê da rêgezên realizma sosyalîst hatine danîn (Moran, 2014:53).

Sovyetan dixwastin ku li ser edebiyat û hunerê îdeolojîya sosyalîzmê perpûn bikin. Ji ber vê yekê hewl didan ku ev fikrê sosyalîzmê bi vî awayî berbelav bibin.

Propagandaya Komînîzmê di Wêjeya Kafkasan da

Sovyeta sosyalîzmê di sala 1917an da ji aliyê Lenîn ve şoreşeke mezîn pêk hat. Li ser fikrên wek biratiya gelan wekhevî, azadî, mafên jinê û çîna proleteriyayê rawestîya û piştgirîyeke xurt dane wan gelên bindest. Fikra komînîzmê di nav cîhanê û di nav Kurdên Kafkasya yê da berbelav bû. Ji aliyê gelên bindest bi kêfxweşî ve hat pejirandin û parastinê.

Ermenistan ji bo kurdan em dikarin bibêjin ku dergahekî rizgarîyê bû. Ji ber zilm û zordestîyê Tirkên û Kurdên xwe nezan û oldar ve hatine şepirze kirin. Kurdên êzîdî ra birçîbûn, talankirin kuştin û qir kirin rewa hatibû dîtin û kesekî ku wan bihebanda tunebû. Heya ku çûne Ermenistanê. Ermenistan ji bo wan wek dinyayeke nû bû. Ne li wir zilm û zordestî ne jî bindestî dîtin. Ermenistan wek hemêza dayika wan li wan xwedî derket û wan hebandin. Ê ku sêwî û bêkes êtîmxana da mezin bûn, her derfetî didane wan. Ji aliyê xwendin û nivîsînê ve pêş ketin. Di sala 1930î da Wêjeya Kurd, carna binavê “Wêjeya Êtîman” jî dihate binav kirin. (Reşît,2012:205) Li wir her çiqas xwendin û nivîsînê da pêş kevin jî lê mixabin ji aliyê zimanê dayîkê ve kêmasîyên wan hebûn. Lewra zimanê xwe yê dayîkê ji bîr kiribûn. Dema ketin nav gelên xwe ew derfet dîtin bi xebatên xurt ve zimanê kurdî pêş xistin. (Reşît,2012:205)

Di heyama Lenîn da ji bo Kurdan û ji bo gelên bindest dinyayeke nû ava bûbû. Kurd bi piştgirîya Ermenistanê û fikra komînîzmê ve ji her alîya ve pêşketibûn. Derheqê vê mijarê da Keskin wiha behs dike:

Di nav “YKSS (*Yekîtîya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê*) da kurdan herî zêde xwe li Ermenîstanê girtibûn. Ji bo pêşketinên ji aliyê çandî, perwerdehî li Ermenîyan piştgirî û derfet dane kurdan. Lewma jî herî zêde kurdên li Ermenîstanê ji aliyê wêje, radyo, perwerdehî, filolojî, şano û hwd ve bi pêş ketin” (Keskin, 2017:165). Bi wan derfetan ve him Kurd pêş ketin him jî di nav xebatên xwe da propagandaya Sovyetan kêr nedikirin.

Kurdên Ermenistanê di serdema Lenîn da wek rojnameya Rîya Teze, Radyoya Yêrîvanê û Wêjeya Kurdî hwd. pêşdaçûn. Di Sovyetê da wek ku dê bê bîr Wêjeya Kurdî bi rêya rojnameya Rîya Teze ve destpê dike. Nivîskarên Kurd berhemên xwe yê ewil di wê rojnameyê da diweşandin û bi rêya rojnamê ve ji xwe ra xwîneran bi dest dixistin. (Reşî,2012:204) Her çiqas wan derfetan didan Kurdan jî ne xêra dê û bavê wan bû dixwestin ku fikra sosyalîzmê û rejîma xwe di nav gelan da berbelav bikin û bidin pejirandin. Armanca rojnameyê ya sereke ji bo çêkirina qeydê nû (yê sosyalîstiyê), organîzekirina wê para gelê Kurd bû di nav Kurdan de propagandakirina siyasî ya wî welatî. (Boyîk,2014:10) Dixwestin ku di rojname, radyo û berhemên nivîskaran da pesnê Lenîn û propagandaya komînîzmê were dayîn.

Radyoya Yêrîvanê jî ji aliyê hişyarbûna Kurdan gelek girîng bû. Bi saya serê radyoyê Kurd bûn xwedî dengê û dîrokeke hevpar.(Gultekîn,2014:28) Di radyoyê da him ji aliyê edebî wek zargotin, çîrok kilam û hwd. him ji aliyê ve nûçe û dengên propagandaya siyasî bilind dibûn.

Bi dîktatorîya Stalîn ra kar û barên çand û kûltûra kurdeyatîyê jî tên rawestandî. Gelek rewşenbîrên Kurd ji kar tên avêtin, tên girtin û nefîkirin. Di dibîstanan da dersên bi zimanê kurdî tên rawestandî. Dawî li elfebaya latînî tê. (Boyîk,2012:15) Rîya Teze û bernameyên radyoya kurdî û di derbarê kurdiyatiyê da her tişt tê girtin û qedexe kirin. Di sala 1955an da ev qedexebûn ji holê rabû û her tişt dîsa eynî wek berê berdewam kir.

Di edebiyata Kafkasan da em digîhîjin vê encamê ku nivîskarên Ermenîstanê him bi xwe bandora fikra komînîzmê da mane him jî di berhemên xwe da wan fikrên sereke bikaranîne û pesnê komînîzmê dane. Em kurteçîroka *Xezalê* da jî dibînin ku razîbûna Lenîn û girîngbûna fikra wî tê ziman. Ji aliyê edebî zêdetir, ji aliyê wê yê siyasî derdikeve pêş me.

Analîza Karakteran di Kurteçîroka *Xezalê* da

Karakter, tebeqeyeke civakî temsîl nake. Qehreman tenê xwe temsîl dike. Dinyaya xwe, bi sexsîyeta xwe ve derdikeve pêş. Em dikarin ji bo karakteran, karakterên Dûz “flat” û karakterên Gilover “round” bibêjin.

Herçiqas taybetmendiyên karakterên dûz ne zêde bin jî lê tenê bi taybetmendiyekê ve derdikevin pêş xwîneran. Ew ji yek wesf û fikrekî pêk tînin.

Karakterên gilover xwedan kesayetekî kompleks in û pir-rehend in. Di heman demê da ew diguherin û dînamîk in.” (Ji darsa mamoste Ömer Delikaya).

“Karakterên gilover ji yekî zêdetir wesfên wan hene û zû bi zû nakevin bin kontrolê, pir rehendî ne, tevlihev in û dema deredikevin sahnayê mirov şaş dikin.” (Alan, 2015:134)

Di sedsala 17an da ji bo karakterên dûz ra “humorous” (komîk) dahatin gotin. Ji wan ra carna digotin “tîp” carna jî digotin “karîkatûr”. Karakterê dûz tenê ji wesfek û fikrekî pêk tê. Dêsmanê da heke zêdetir wesf hebe wê çaxê ji kêlekê ve ditewe û şiklekî gilover hildide. (E.M. Forster, 2016:107).

Kurteçîroka Xezalê da Xezal serlehenga çîrokê ye. Bi nasnameya xwe ya jin, xwende, zana va derdikeve pêş me. Ji alîyê xwe yê zanebûnê û xwendinê ve li hemberî kevneşopîyên pûç û xurafeyan dertê.

Xezal doxtorîyê xilas dike û tê gundê xwe (Elegezê) li wir zarokek nexweş û li ber mirinê ye. Xezal dibihêse û diçe mala wan. Lê di malê da şêxa gund (şêx werda) nahêle ku Xezal, zarokî derzî bike. Em dikarin vê mînakê nîşan bidin;

“Wîî... xwedê, gunehên min zaf in, ev qîzika çi dike? Çi ji tîfalî dixwaze? Dê gede biherimîne, bi wan derzîyên xwe yên heram! Gedê cinetî dê biherimîne... Sînem te porê xwe kur kirê! Tu çi sekinîyê û lê dinhêrî, kurbûyê li ber şavên te dergûşa te diherimîn! Gede va can dide, bi ruhsitîne xwe re şer dike, ew jî hatîye wî diherimîne! Xwedê, tu kevir û kuçan bi serên me da bibarînî, zulma weha jî dibe? Li min gunehkarê!” (r.36)

Di dawiyê da Xezal diya gede Sînemê îqna dike û derzî gede dixwe û gede pak dibe.

Xezal: Karekterê dûz e. Tevgerên wê di serî da hetanî dawîya çîrokî da neguherîye. Bi heman rewşê didomîne.

Çawa ku Xezal di serî da naxweze bizevice heya dawî da jî ev fikra wê naguhere. Ne ji bo zewacê ne jî ji bo xwendinê.

“- Ax dayê can, wextê min û mêrkirinê nîne. Min ji te ra gotiye, ez dixwazim bixwînim. Ez hê zaro me, ez ê bixwînim, bibim doktor. (r.13)

Bavê Karê (Biro): karakterekî dûz e. Di serî da jî naxweze keça wê bixwine û vê fikra wî heta dawiyê jî naguhere. Girêdayî kevneşopîyên xwe ye. Xwendina jinê ji bo wî rûreşîyeke mezin e.

“Qancix, ma bes nîne, tu min bêrûmet dikî? Tu heta koma dehan çûyî, te kuta kir êdî bes e! Ez nahêlim tu herî xwendinê, ew jî li Êrivanê û bi tenê din av mêran da... Haho... Ma qey min serê xwe danîye, ez di bin ax berên sar da me, erê? Kîjan qîz ku dixwaze bi tenê here bixwîne û li Rewanê, bê xwedî ye.” (r.17)

Bavê Xezalê (Mecîd): Karakterekî gilover e. Cara ewil li hemberê xwendina jinê ye. Lê di piştî

demekî şûn da bi tesîra sosyalîzm û îqna kirina malbatê fikra wî diguhere.

“Bavê min jî digot “ez nahêlim” lê ez û diya xwe bi lavan, bi ricayan hatinê; bi qurban bi heyran heta ew qayîl bû. Rihê me pê ra kişya...” (r.10).

Encam

Em bi rêya vê kurteçîrokê dikarin vê encamê derxin. Sîma Semend çawa ku di bin bandora sosyalîzmê da mabe her wisa di çîrokên xwe da jî fikra sosyalîzmê derdixe pêş me. Em dikarin bibêjin ku çîrokên Sîma Semend wek propagandeyê komînîzmê ye. Ji aliyê xwe yê edebî zêdetir aliyê xwe yê siyasî ve derdikeve pêş xwîneran. Rizgarîya jinê bi wî awayî dibîne û dixwaze jinê di nav civakê da wek parçeyê jiyana civakî bide pejirandinê. Ji ber vî yekî temayên çîrokên wê jin in. Hemberî kevneşopîyan û feodalîteyê ye. Di çîroka *Xezalê* da jî xuya dike ku malbata Xezalê û malbata Karê tê berawird kirin. Malbata Xezalê bi tesîra sosyalîzmê ve her xwestekên Xezalê dînin cih. Lê mixabin Karê wek Xezalê xweşbext nîne. Qurbana hikmê bavkaniyê dibe. Sosyalîzm mixabin li ser malbata Karê tesîr nake û dev ji bavkaniyê bernadin.

Çavkanî

Alan, Remezan (2015). *Despêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*, Stenbol: Peywend.

Semend, Sîma (2015). *Xezal*, İstanbul: Avesta.

Boyik, Eskerê (2012). *Çanda Kurdên Sovêtê*, Stenbol: Deng.

Keskin, Songül (2017). “Lênêrînek li Çîroka Xezala Sîma Semend: Li Gel Şoreşa Sovyetê Pirsgirêka Jinê”, *Wêje û Rexne*, h.9/10.

Aydoğan, İbrahim Seydo (2012). “Dil ve Edebiyat Mutfağında Kürt Kadını”, *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, İstanbul: Sanat ve Kuram.

Moran, Berna (2014). *Edebiyat Kurumları ve Eleştiri*, İstanbul: İletişim.

Reşît, Tosinê (2012). “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebiyatı”, *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, İstanbul: Sanat ve Kuram.

Boyîk, Eskerê (2014). “Rojnameya Rîya Teze”, *Nûbihar*, h.126.

Gultekîn, Nîhat (2014). “Qonaxa Rewşenbîriya Zimanê Kurdî: Radyoya Yêrîvanê”, *Nûbihar*, h.126.